# Newroz



**Dr Nûredîn Zaza**
1919- 1988



**Osman Sebrî**
1905 - 1993

*Xebat ji bo* : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê* - YEKÎTÎ

**Hejmar ( 95 ) sal 16 Berç ele 2010 z - 2622 k Buha ( 15 )ps**


## Rêwresma çilrojiya serokê partiya me Nemir Ismaîl Umer li Qereqoyê



Roja Înê 26.11.2010an, nêzîkî 2000 kesî ji dost, heval û hezkiriyên gorbuhuşt mamoste **Ismaîl Umer** digel şandeyên pariyên tevgera welatparêza Kurd û hêzên siyasî yên Ereb û Asûr, komîteyên mafên mirov û rêxistinên civaka sîvil, kesayetiyên serbixwe, nivîskar û hezkerên ziman û wêjeya Kurdî û hin serokên hoz û êlên Kurd û Ereban, li gundê Qereqoyê, bi rondikên xemgîniyê û baxên gul û çîçekan serdana gora mamoste Ismaîl Umer kirin.

Te çawa çavên xwe li derdora gora mamoste ya ku bi rengekî sipehî û bedew hatibû çêkirin û kiraskirin bigeranda, te dostên wî yên dilsoz ji mêr, jin û pîr û kalan, ji hemî netewe û olan, bi axîn, kul û keser rondikên xwe vedimaltin didîtin. Vêja te digot qey mamoste ji nû ve çavên xwe girtine û xatirê dawî xwestiye!.. Kat 11 û 15 xuleyan, helbestvan û nivîskarê Kurd Dilawerê Zengî, bi rawestana xuleyeke bê deng dest bi ahengê kir û ev gotinên li jêr hatin xwendin:

**1**-Gotina Encûmena Siyasî ya Kurd li Sûriyê ji bal birêz **Ismaîl Hemê** ve hate xwendin.

**2**-Gotina Rêxistina Asûrî ya Demokrat li Sûriyê ji bal birêz **Gebriyêl Mûşê** ve hate xwendin. D.R.( 3 )


**Tu Çiyakî mezin** — Diljar Emîn — 4

**Çiyayê Kurmênc Reş girêda** — 6

**Reşîd Hemo** — Bilal Hesen — 9

**Kurtejiyana…** — Hesenê Cumî — 10



Email : Newroz 95 @ hotmail . com